

Li benda çi bin?

# DAXWAZA MIN A PENABERIYÊ

Dema ku hûn li benda biryarê ne, bêy erêkirinê, welêt terk nekin û neçin welatekî din.

→ Eger hûn nekarin vegerin welatê xwe ji ber ku ew ne ewle ye, hûn dikarin li vir daxwaza penaberiyê bikin.

→ Penaberî wekî parastina navneteweyî jî tê binavkirin.

→ Zarokek (di bin 18 salî de) ku bi tena serê xwe hatiye, dê kesek jê re were destnîşankirin ku jê re sergêr tê gotin da ku piştgirîyê radest bike.

→ Piştî nirxandina hemû agahiyan, efser dê biryar bidin ka hûn hewceyê penaberiyê ne an na.

## QEYDKIRIN

Efser dê daxwaza we qeyd bikin, wêneyê we û şopa tiliyên we bigirin (eger hûn ji 6 salî mezintir bin), û belgeyên we kontrol bikin.

Belgeyek dê ji we re were dayîn ku nîşan dide we daxwaza penaberiyê kiriye. Li cihekî ewle ragire.

Piştî qeydkirinê, dawetnameyek ji we re tê şandin ku tê de dîrok, dem û cîhê hevpeyvînê hene.

## LI BENDA HEVPEYVÎNA XWE

Hûn ê li cihekî ewle bimînin. Dema ku hûn li bendê ne, hewl bidin ku xwe mijûl bikin.

Zimanê herêmî hîn bibe, hevalên nû peyda bike, werzîşê bike û saxlem bimîne.

Ji şêwirmendekî qanûnî an sergêrê xwe bixwazin ku ji bo amadekariya hevpeyvînê alîkariya we bikin.



**Hevpeyvîna xwe ya penaberiyê ji dest xwe bernedin! Eger hûn nexweş in, efseran agahdar bikin.**

## HEVPEYVÎNA WE YA PENABERIYÊ

Dê ji we were pirsîn ka we çima we welatê xwe terikandiye, li ser malbata we, jiyana li welatê we û rêwîtiyên we çi hatiye gotin.

Belgeyên (nasname, wêne, rapor) ji bo piştgiriya çîroka xwe bi xwe re bînin.

## BIRYAR

Piştî çend mehan, hûn ê ji biryara dawî werin agahdarkirin.

Eger bersiv erênî be, hûn dikarin li welêt bimînin û biçin avahiyek mayîndetir.

Eger encam neyînî be, hûn ê li ser vebijarkên ewledar ên vegera malê werin agahdarkirin. Eger hûn bi biryarê razî nebin, hûn dikarin bi fermî îtîraz bikin. Ev yek wekî îtîraz tê binavkirin.

## JI BÎR MEKE

- Hûn dikarin ji bo şîreta li ser vegerandina welat an jî çawaniya îtîrazkirina li dijî biryareke neyînî bi parêzerekî re şêwir bikin.
- Eger tu bi ziman nizanibî, ji kerema xwe wergêrek bixwaze.
- Eger hûn nekarin bersiva pirsên ku efser ji we dipirse bidin, hûn dikarin wiya bibêjin.
- Divê hemû efser bi rêzdarî bi we re tevbigerin.
- Bi efseran re hevkariyê bikin. Eger tiştek ku ew dibêjin ne diyar e, ji wan bipirsin ka mebesta wan çi ye.



Kurdish Kurmanji

euaa EUROPEAN UNION AGENCY FOR ASYLUM

© Ajansa Penaberiyê ya Yekîtiya Ewropayê, 2025